DOSYAYA HEJMARÊ

# Çi ye ev – Fîlozofî? (1)


**Martin Heidegger**



Werger: Selam ÇINAR

Em bi vê pirsê, qala mijareka pir berfireh, mijareka belavbûyî dikin. Ji ber ku ev mijar pir fireh e, ne-dîyar dimîne. Ji ber ku mijar ne-dîyar e, em dikarin ji her hêlê ve li ser wê bisekinin. Bi vî awayî, em ê timî tiştekî rast peyda bikin. Lê dema ku em li ser vê mijarê bisekinin, ji ber ku hemî nêrînên pêkan tevlîhev dibin, em bi vê xetereyê ra rû bi rû dibin: dibe ku axaftina me ji baldarîyeka zexm bêrî be.

Ji ber vê, divê em lê bixebitin ku em pirsê baş dest nîşan bikin. Bi vî awayî, em ê bikarin berê axaftina xwe bidin hêleka baş. Her weha, dê axaftina me têkeve rêyekê. Ez dibêjim rêyekê: Bi vêya, em li xwe mikur tên ku ev rê, ne rêya yekta ye. Bi ser da jî, em bêgav in ku zelal bikin, bê ka ev rêya ku ez ê li jêrê rêyî we bidim, birra jî ew rê ye ku destûrê



bide me, hem em pirsê bikin û hem jî bersiva wê bidin an na.

Hesêbkî ji bo em pirsê baş dest nîşan bikin, em dikarin rêyekê bibînin; wê çaxê, li hember mijara axaftina me liber-rabûnek girîng dertê holê. Dema em dipirsin û dibêjin, "Çi ye ev – fîlozofî?" em li ser fîlozofîyê diaxivin. Bi pirsîna bi vî awayî, dîyar

e ku em li ser fîlozofîyê, ango li derveyî wê li derekê dimînin. Lê armanca pirsa me, ketina hundirê fîlozofîyê ye, mayîna di hundirê wê da ye, tevgerîna li gorî wê ye, ango xebitîna tê da ye.
Loma, divê berê berê, rêya axaftina me hem li hêleka dîyar be hem jî ew hêl, bawerîyê bide me ku em di hundirê fîlozofîyê da tevdigerin, ne li derveyî wê an li derdora wê.
Naxwe divê, rêya axaftina me tewirek û li hêleka weha be ku tiştê fîlozofî ji xwe ra dike mijar, bi me bixwe têkildar be û bandorê di kakilê[(2)] me da li ser me çêbike (nous touch).

Lê ku weha be ma dê fîlozofî nebe mijara hestbirin, [(3)] hestkirin û hestan?
"Bi hestên xweş wêjeya ne-xweş tê çêkirin."[(4)] Ev peyva André Gide'î ne bi tenê li wêjeyê, pir bêtir li fîlozofîyê tê. Cîyê hestan, ên herî xweş jî tê da, di fîlozofîyê da tune ye.
Wekî tê gotin, hest, tiştinên der-aqil (irrational) in. Li hember vêya, fîlozofî, ne tenê bi êqil ra digunce (rational), ji bilî vê, rêvebera esil a êqil (ratio) e jî. Bi vê angaştê, bêhemdî, me
biryara bê 'fîlozofî çi ye' da. Bi vê bersivê, me pirsa xwe li paş xwe hişt. Her kes angaşta ku fîlozofî karê êqil e, rast dibîne. Dibe ku dîsa jî, ev angaşt bersiveka bilez be ji bo pirsa "Çi ye ev – fîlozofî?" Lewra, li hember vê bersivê, em dikarin hema di cî da pirsên nû bikin. Çi ye
ev-aqil? Li ku û ji hêla kê ve biryara çi-bûna êqil hat dayîn? Ma êqil bixwe, xwe kir serwerê fîlozofîyê? Ger ku bersiv "erê" be, bi kîjan heqî? Ger ku bersiv "na" be, vê rol û peywira xwe ji ku derdixe? Eger, ev tiştê ku ratio tê hesibandin, cara ewil û tenê ji hêla fîlozofîyê ve, di dîroka fîlozofîyê da hatibe destnîşankirin, hîn ji destpêkê, rêdana fîlozofîyê wekî karê êqil, rêyeka ne-baş e. Lê belê, em ji pênasekirina fîlozofîyê ya ku dibêje, fîlozofî çalakîyek e ku bi êqil ra digunce, guman bikin, dê demildest bi heman awayî ev jî bi guman be: bê fîlozofî dikeve yan nakeve warê der-aqilîyê jî. Ji ber ku, kesekî ku bixwaze fîlozofîyê der-aqil dîyar bike, wexta ku weha

*1 Ev deq, gotara konferansekê ye. Konferans, di tebaxa 1955'an da, li Cerisy la Salle, li Normandîyayê, Fransayê, hatîye çêkirin.*
*Ev gotar ji berawirdkirina Îngilîzî û Tirkî hatîye wergerandin.*
*Navê deqê: Bi Fransî: Qu'est-ce que la Philosophie? Bi Almanî: "Was ist das – die Philosophie?" Bi Îngilîzî: "What is That – Philosophy?"*
*2 Bi Almanî: Wesen, bi Îngilîzî: Essence*
*3 Hestbirin: Betroffenheit; Affectedness.*
*4 André Gide, Dostoyevsky (Paris: Plon-Nourrit, 1923), p. 247.*

dike, cardin, a ku li êqil digunce, wekî pîvana cudakirinê dipejirîne û bi
vî awayî, cardin, weha dihesibîne ku dizane aqil (ratio) çi ye.

Em, tişta ku mijara fîlozofîyê ye, wekî tiştekî bi me mirovan ji kakilê me ve pêwendîdar e û bandorê li me dike, îşaret dikin; lê dibe ku halê hestbirinê ku xelk jê ra dibêje, hestîyarî û hest, bi ya der-aqil ra, ne pêwendîdar be.

Ji tiştên ku heta niha me gotine, bi tenê encameka weha derdikeve: hewldana axaftineka li ser navê "Çi ye ev – fîlozofî?" baldarîyeka zêdetir divê.

Ji bo ku em di nav têgihên kêfî û bêhemdî yên di barê fîlozofîyê da, bê armanc bi vir da wê da neçin û neyên, berê berê, divê em lê bixebitin ku em pirsa xwe bînin ser rêyeka
naskirî. Lê belê, em ê rêyeka ku em bikarin li serê pirsa xwe bi ewlehî dîyar bikin, çawa bibînin?


Niha rêya ku dixwazim rê bidim, va ye li ber me ye. Û em, sirf ji ber ku pir nêzîk e, wê bi zorê dibînin. Lê piştî ku me ew dît, hîn jî bi halekî ku em nizanin em ê çi bikin, em ê li serê bimeşin. Em dipirsin: "Çi ye ev – fîlozofî?" Heta niha me peyva "fîlozofî"yê pir bi kar anî.
Êdî em ê peyva fîlozfîyê wekî sernavekî mehandî (maşandî) bi kar neynin; li şûna wê, ku em ji jêdera wê, li peyva fîlozofîyê guhdarî bikin, dê dengekî weha bê me: philosophia. Peyva "fîlozofî"yê, niha bi Grekî diaxive. Peyva Grekî, wekî peyveka Grekî, rêyek e. Ji hêlekê ve, ev rê li ber me ye, ji ber ku, berî me gelekî li ser vê peyvê hatîye axaftin. Ji hêleka din ve, êdî li dû me ye, ji ber ku me her gav ev peyv bihîstîye û gotîye. Li gorî vêya, peyva bi Grekî philosophia, rêyek e ku em li ser wê, bi rê da ne. Lê belê, tevî ku di barê fîlozofîya Grekan da gelek agahîyên me yên dîrokî hene û em dikarin wan belav bikin jî, em vê rêyê, tenê hema hema nas dikin.

Peyva "philosophia"yê, ji me ra dibêje, fîlozofî ew tişt e ku cara ewil he-bûna şaristanîya Grekan dîyar kirîye. Lê ne ev tenê ye: philosophia, navika dîroka me ya EwropîRojavayî jî dîyar dike. Gotina ku pir tê bihîstin, a "Fîlozofîya Rojava-Ewropî" bi rastî totolojî ye. Çima? Ji ber ku "fîlozofî" bi kakilê xwe bi Grekî ye: li vê derê gotina 'bi Grekî' bi vê maneyê ye: fîlozofî bi resenîya xwezaya xwe weha ye ku ji bo xwe bi pêş ve bibe, cîyê xwe, berê berê li nav Grekan û bi tenê li wir çêkirîye.

Lê çi fêde, dema ku fîlozofî di dewra Serdema nû-ya-Ewropayê da serwer bû, ji hêla têgihên Xiristîyanîyê ve hat birêvebirin û serwerî lê hat kirin. Serwerîya van têgihan ji hêla
Serdema Navîn ve hat guhastin. Cardin jî, nabe ku em bibêjin fîlozofî bi

vî awayî bûye Xiristîyan û fîlozofî bawerkirina ji wehîya xwedê û otorîteya dêrê ye. Hevoka "Fîlozofî ji xwezaya xwe bi Grekî ye" ji vî tiştî pê ve tiştekî nabêje: Rojava û Ewropa, bi tenê ew, di gavên xwe yên herî kûr ên dîrokî da ji kokê ve "fîlozofî" ne.[5] Berjenga vê, pêşketina zanistîyan û serwerîya wan e. Zanistî, ji ber ku ji gavên dîrokî yên herî kûr ên RojavayîEwropî, ango yên fîlozofî derçûne, îro di wê astê da ne ku teşe bidin temamê dîroka mirovahîyê ya li cîhanê.

Em hinekî bala xwe bidinê, bê ka navlêkirina çaxeka dîroka mirovahîyê wekî "çaxa atom"ê, tê çi maneyê. Vejena atomê ya ku zanistîyan ew derxistîye holê, wekî hêza ku divê birêveçûna dîrokê dîyar bike, tê sêwirandin. Eger ku fîlozofî berî zanistîyan nehata û li pêşîya wan nemeşîya, helbet dê tu carî zanistî he nebûna. Lê belê fîlozofî philosophia ye. Ev peyva bi Grekî, axaftina me bi kevneşopîyeka dîrokî ve girê dide. Ji ber ku, dê ev kevneşopî yekta
bimîne, maneya wê jî yek e. Kevneşopîya ku peyva dîrokî philosophia'yê dide me û bi vê peyvê tê binavkirin, alîyê (navnîşan) rêya ku em li serê pirsa "Çi ye ev – fîlozofî?" dikin, dîyar dike. Ev



5 Li vir ne bi Heidegger'î ra me û li dijî vê fikra wî ku li cînên din jî derbas dibe, weha li ber radibim: "Her ziman fîlozofî ye." (Şiroveya wergêr.)
6 Kevneşopî; Tradition: "Überlieferung"; tîp bi tîp "teslîmkirin" e. Peyva Traditioyê di Latînî da hem bi maneya "teslîmkirin (delivery)"ê hem jî bi maneya "îxanet, xapandin (betrayal)"ê ye.
Délivrer (Frensî): Xelaskirin. Bi Îngilîzî, Deliver.

kevneşopî me nade destê ya çêbûyî û rabirdûyê. Teslîmkirin, délivrer[6] , xelaskirin e, ango gihaştina azadîya axaftinê ye bi rabirdûyê ra. Navê “fîlozofîyê”, eger ku em vê peyvê rast dibihîzin û eger ku em li tiştê ku em dibihîzin diramin, bangî me dike ku em biçin kok û dîroka wê ya Grekî. Peyva philosophia’yê, hema hema li ser belgeya çêbûna me disekine; em dikarin weha jî bibêjin: ew li ser belgeya çêbûna vê dewra dîroka dinyayê ku navê çaxa atomê li xwe kirîye, disekine. Loma, bi şertê ku em bi ramana Grekan ra biaxivin,
em dikarin pirsa, “Çi ye ev – fîlozofî?” bikin.

Ne bi tenê çi’ya di pirsê da, lê belê awayê pirskirina me jî, bi koka xwe bi Grekî ye. Awayê pirskirina me ya îro jî bi Grekî ye.

Em dipirsin… Çi ye ev? Dengê ku bi Grekî tê me ev e: ti estin. Lê belê, pirsa çi-yetîya tiştekî, pirmaneyî ye. Em dikarin weha bipirsin: “Çi ye ew tiştê li dûr?” Bersiv: “dar e.” Ev bersiv, ji xeynî navlêkirina tiştekî ku me ew nas nedikir, ne tiştek e.

Lê em dikarin pirsên xwe bidomînin: “Tişta ku em jê ra dibêjin ‘dar’ çi ye?” A em bi vê pirsê nêzî ti estin’a Grekî dibin. Awayê pirsê yê ku Sokrates, Platon û Arîstoteles bi pêş ve birine, ev e. Li ser meselê, ew, weha dipirsin: “Çi ye ev – xweşik? Çi ye ev – zanîn? Çi ye ev – xweza? Çi ye ev – tevger?”

Lê niha, bi pirsên xwe, em ne tenê li pênasekirineka baştir a çi-yetîya xweza, tevger û xweşikê digerin, berovajî vê, her weha, divê bala mirov lê be ku şiroveyek e li ser bê ka
maneya “çi”yê çi ye û divê mirov ji “çi”yê (ti) çi fam bike. Di “quid est”ê da ya ku tê maneya ‘çi’yê quid e, quidditas e, ango çi-yetî ye. Her weha, çi-yetî (Quidditas), di dewrên cuda yên fîlozofîyê da, bi awayên cuda tên dîyarkirin. Li ser meselê, fîlozofîya Platon’î şiroveyeka balkêş a maneya ‘çi’yê (ti) ye. Ew, çi, tê maneya Îdea’yê. Bi pirskirina ti’yê, quid’ê, qestkirina “îdea”yê, qet ne tiştekî weha ye ku jixweber zelal be. Şiroveya ‘çi’yê (ti) ya Arîstoteles’î ji ya Platon’î cuda ye. Kant şiroveyeka din a çi’yê pêşkêş dike. Hegel yeka din.

Tişta ku li ser ti’yê, quid’ê, çi’yê tê pirskirin, her carê, bivênevê ji nû ve bê dîyarkirin. Çi dibe bila bibe, ev ji ber dimîne: gava ku mirov bi fîlozofîyê ra pêwendîdar pirsa “Çi ye ev?” kir,pirseka ku bi eslê xwe Grekî ye, dike.

Em baş bala xwe bidin vêya: hem mijara pirsa me: “fîlozofî”, hem jî awayê pirskirina me: “Çi ye ev?...”, her du jî dê ji kokên xwe ve, bi Grekî bimînin. Em peyva “fîlozofî”yê neynin ser zimanê xwe jî, koka me ev e. Ne tenê gava em pirsa “Çi ye ev – fîlozofî?” dikin, lê çawa ku em meyla wê dikin, bangî me tê kirin,

ku em vegerin ser vê kokê, ji bo wê û ji hêla wê ve, em bi paş ve tên xwestin. [pirsa fîlozofî çi ye, ne pirsek e ku li zanîneka dîyar (fîlozofîya fîlozofîyê) digere. Pirs, ne pirseka lêkolîna dîrokê ye ku bi pêşketin û destpêkirina tişta ku jê ra dibêjin fîlozofî têkildar e. Pirs dîrokî ye, ango pirseka felekî (7) ye. Ew ne tenê "pirs"ek e, serbarî wê, pirsa dîrokî ya he-bûna me Ewropî-Rojavayî ye.]

Wexta em, xwe bera nav maneya esil û tevayî ya pirsa, "Çi ye ev – fîlozofî?" didin, pirs bi rêya kokên xwe yên dîrokî, ber bi dahatûyeka dîrokî ve bi rê dikeve. Me rêyek dît. Pirs bixwe rêyek e. Ev rê, ji şaristanîya Grekan ber bi me ve tê, dibe ku ji me jî bibihure. Em – ger em di pirsê da bi rik bin- li ser rêyeka dîyar in. Dîsa jî, temînateka rasterast tune ye, bê em ê li ser vê rêyê bi awayekî rast bimeşin an na. Serbarî vê, em, hema di cî da nikarin dîyar bikin bê ka em li ku dera vê rêyê ne. Ji mêj ve ye, pirsa ku li çi-yetîya tiştekî dipirse, bi pirsa "Kakil çi ye?" tê pênasekirin. Pirsa di barê xweza û kakilê da, (8) her carê, gava tişta ku kakilê wê tê pirsîn bixwe dernixûn dibe û tarî dikeve serê, an jî, gava pêwendîya mirov bi tişta ku tê pirsîn ra xera dibe yan jî mirov bi temamî jê vediqete, hişyar dibe.

Pirsa axaftina me, li ser kakilê fîlozofîyê ye. Eger ku, ev pirs, ji pêdivîyekê çêbûye û ne tenê bi armanca mijûlbûnê ku qaşo em mijûl bibin, hatibe kirin; û eger, divê ku weha jî nemîne, naxwe, divê fîlozofî wekî fîlozofî bixwe, ji me ra bûbe tiştekî biguman. Ma birra jî weha ye? Ger bersiv "erê" be, fîlozofî bi çi awayî ji bo me bûye tiştekî biguman? Dîyar e, piştî ku em çavekî li fîlozofîyê bigerînin, em ê bikarin bersiva vêya bidin. Ji bo vêya, divê pêşîyê em bizanin bê çi ye ev – fîlozofî. Loma, bi awayekî seyr, em di daîreyekê da diçin û tên. Wekî ku fîlozofî bixwe ev daîre be. Em werê bihesibînin ku em nikarin xwe ji lepê vê çenberê rasterast xelas bikin; lê cardin jî, em dikarin çav lê bigerînin. Divê berê me li kîjan hêlê be? Peyva bi grekî philosophia, wê hêlê rêyî me dide.

Li vir, lêkolîn û çavdêrîyeka kûr lazim e. Niha û paşê jî, her ku em li peyvên Grekî guhdarî dikin, em dikevin qadeka resen. Ji ber ku, bera bera dîyar dibe ku Grekî ne

---

*7 Felekî: Bê-veger; bê çare; fate-ful: geschick-liche. (Rengdêra Almanî (geschichtliche) ku ji peyva Geschick'ê (Çarenûs) hatîye çêkirin, ne bi maneya ferhengî ye.)*


*8 Xweza yan Kakil: Alm. Wesen; Îng. Essence, nature*

*9 Li perawêza 5'an binêrin.*

*10 Logos: Peyv, axivîn, pênase, aqil, jîrîya hişî, rêje, hesab.*

wekî
zimanên din ên Ewropî ye ku em nas dikin.[(9)] Grekî, bi tenê Grekî, logos[(10)] e. Di axaftinên xwe da, em ê mejbûr bimînin ku em bêtir bi kûrayî qala vê bikin. Ji bo destpêkê têrê dike ku em vê destnîşan bikin: di Grekî da, tişta ku tê gotin, bi awayekî bêhemta, hema pê ra, tişta ku me ew bi gotinê anîye zimên e jî. Gava ku em peyvyeka Grekî bi guhê Grekî dibihîzin, em legein'a wê, a ku ew rasterast îşaret dike jî, dişopînin. A ku ew îşaret dike, a li ber me ye. Bi peyva Grekî ku em dibihîzin, em rasterast bi wî tiştî ra ne ku li ber me sekinîye; hew ne tenê bi maneya peyvê ya devkî.

Peyva philosophia'yê ya bi Grekî, ji philosophos'ê tê. Koka vê peyvê rengdêr e, wekî philargyros'ê (zîvhez), philotimos'ê (rûmethez). Weha tê gumankirin ku Heraklîtos'î peyva philosophos'ê çêkirîye. Tê vê maneyê: ji bo Heraklîtos'î hîn philosophia tune bû. Aner philosophos,
[(11)] ne mirovekî fîlozofî bû. Rengdêra Grekî philosophos ji tiştên ku rengdêra fîlozofî-yane (philosophique, philosophical) derdibire, bi tevayî cudatir tiştan dibêje. Aner philosophos'ek, hos philei to sophon e, ango ew kes e ku ji sophon'ê[(12)] hez dike. Philein, hezkirin, li vê derê bi awayê ku Heraklîtos bi kar tîne bi



vê maneyê ye: homolegein, ango axaftina bi awayê Logos'ê. Axivîna beramberî Logos'ê.(13) Ev beramberî, bi sophon'ê ra li hev dike. Lihevkirin, aheng, harmonia ye. Ev, lihevkirina tiştekî, bi ya din ra, bi awayê beramberbûnê ye. Du tişt, ji ber ku dijber in û li ber fermana hev in, di bingehê da li hev dikin. Ev harmonia (lihevkirin, aheng,), awayekî taybet ê philein'ê, yê hezkirinê ye ku bi awayê ramîna Heraklîtos'î gihaştîye.

Aner philosophos, ji sophonê hez dike. Wergera vê peyvê, bi awayê ku Heraklîtos jê fam dike dijwar e. Lê em dikarin wê li gorî şiroveya Heraklîtos'î bixwe, rave bikin. Li gorî vê to sophon vê dibêje: Hen Panta, "Her tişt yek (e)". Li vê derê "her tişt" bi vê maneyê ye: panta to onta, tevayîya hemî heyî'yan (ên-ku-hene). Hen, ango yek, ev e: yek, yekta, a ku her tiştî digihêjîne hev. Lê belê, hemî heyî, di he'(14)yê da yek in. Sophon vê dibêje: heyî giş, di he'yê da ne. Ku em bi awayekî xurttir bibêjin: he, (hemî) heyî ye. Li vir "(y)e" (lêkera bûnê) gerguhêz e û bi maneya "komkirin"ê ye. He heyîyan (ên-ku-he-ne) li hev kom dike. He, lihevkom-kirin e – Logos.

Hemî heyî, di he'yê da ne. Bihîstina tiştekî weha ji guhan ra xweş nayê, jê zêdetir wekî çêrekê xuya dike. Ji ber ku, ji tu kesî ra hewce nake ku bi heyî'yên he'yê dakeve. Dinya dizane 'a ku he ye', heyî ye. Heyî, ku he nebe, dê çi bike? Kombûna heyîyan di he'yê da, bi xuyabûna he'yê, xuyabûna heyîyan, dîsa jî, pêşîyê û bi tenê Grekî ecêbmayî hiştin. Ji bo Grekîyan, a ku herî zêde diheyirîne, ev bû: Heyî'yên di he'yê da.

Her weha, Grekî jî, mejbûr man

*11 Aner: Mêr, mirov.*

*12 Sophon: Heidegger vê peyvê di vê semînerê da wernagerîne. Di rûpelên jêr da wê wekî, "Heyîya di he'yê da" şirove dike.Maneya wê ya ferhengî, "zana" ye.*

*13 Axivîn: Sprechen; To speak. / Axivîna Beramber: Entsprechen; To speak in accordance with. (Ji ber ku peyva beramber, bi maneyeka xwe dijberîyê jî didêre, min bi taybetî ew bi kar anî.)*

*14 He: Berî her tiştî "he" he ye. He, he ye. He, xwe ye, ya ku xwebixwe he ye, xwebixwe ye, ya ku bi tenê dişibe xwe. He kakil e. He sersebeb e. He serseba her tiştî ye. Ziman, zimanê he'yê ye. Heta ku he ne-be heyî nabe. Ji ber ku he, he ye, hebûn karîger e; heyî he dibin. He, herdem-he-bûn e. He derfet e. A her tiştî ye, a zimên e jî. Jixwe yên ku hene giş heyî ne û "he" bi awayekî gişmend ji yên ku he ne gişan pirtir e. He, şênberîya heyî'yê ya razber e. Ne razber e, lê di nava yên ku hene da yek e, yekta ye, bi serê xwe he ye, di gişan da he ye. Bi vî awayî razber e. Şênberîya wê hebûna yên-ku-he-ne giş in. He, bi heyî'yan şênber dibe: lê belê ne şênberîyeka asayî ye, di çeşnê pêjn û teyisînê da ye. Cardin jî heyî yek bi yek nabin he; her yek ji heyî'yan teyisînên he'yê ne. Ê ku herî zêde, herî baş û herî zelal "he" tê da xwe rê dide ziman e. An pê dikare xwe rê bide ziman e ( ji bo têgihaştinê). Xwe-rêdan şîyana he'yê ye; xwe-rêdan ne di maneya ketina tixûbê bînahîyê da ye, ramanî ye, pêjnî ye. Bi ponijînê û di mirov da ev şîyan karîger dibe: mirov bi ponijînê, bi kûr-û-têr-ramînê dikare bi he'yê bihese, he'yê seh bike, lê biferice. Ev fericîn, hişî, ramanî û hestî ye. Lê "he" jixwe her tim he ye. Mirov pê nehese jî, di heyî'yan da he ye. Heyî ne bin, he he nabe. (Şiroveya Wergêr)*

ku pirhêjabûna ya ku diheyirîne ( li hember êrîşên hişê sofîstên ku li ser her tiştî fikreka wan he ye û raveyeka wan a ku di cî da her kes dikare jê fam bike, he ye) xelas bikin û wê biparêzin. A ku mirov herî zêde diheyirîne (Heyîya di he'yê da),

bi birêketina hinek kesan ber bi ya herî zêde diheyirîne ve, ango ber bi sophon'ê ve, hat parastin. Bi vî awayî, van kesên ha, bûn ew kesên ku têdikoşin bigihêjin sophon'ê û bi vê têkoşîna xwe jî, bi mirovên din ra hesreta sophon'ê tev rakirin û ev hesret hişyar hiştin.

Philein to sophon'a, ku berê navê wê bihurî, lihevkirina bi sophon'ê ra, ango harmonia, bû orexis, [15] bû têkoşîna gihaştina sophon'ê. [16] Sophon, dibe mijara lêgerîneka taybet. Ji ber ku êdî di navbera philein û sophon'ê da lihevkirineka bingehîn tune ye; berovajî vê, ji ber ku bû

têkoşîneka taybet ber bi gihaştina sophon'ê ve, philein to sophon vediguhere "philosophia"yê.

Eros[17] têkoşîna bo philosophia'yê dîyar dike.

Lêgerîna ku dixwaze bigihêje sophon'ê, Hen Panta[18]'yê, heyî'ya di he'yê da, niha werdigere vê pirsê: "Çi ye ev he'ya heyî'yan?" Ramîn, cara pêşîyê niha werdigere "fîlozofî"yê. Heraklîtos û Parmenîdes hîn ne "fîlozof" bûn. Çima ne? Ji ber ku ramyarên mezintir bûn. Li vê derê "mezintir" ne nirxandina jîrbûnê ye; awayekî din ê ramînê îşaret dike. Heraklîtos û Parmenîdes, bi vî awayî "mezintir" bûn: ew hîn bi Logos'ê ra, ango bi Hen Panta'yê ra li hev bûn. Gava yekem a ber bi fîlozofîyê ve, ku Sofîstan amade kiribû, pêşîyê ji hêla Sokrates û Platon'î ve hat avêtin. Piştî Heraklîtos'î li nêzîkî du sed salî, Arîstoteles 'vê gavê' weha pênase dike: "Jixwe, tişta ku fîlozofî berê berê û niha jî û her car ber bi wê ve bi rê dikeve û her car nikare rêya têketina wê bibîne, ev e: He çi ye? (ti to on)."

Fîlozofî, li çi-bûna 'heyî'yan digere. Fîlozofî, ber bi he'ya heyî'yê ve, ango ji hêla he'yê ve, ber bi heyî'yê ve, bi rê da ye. Arîstoteles, bi lêzedekirina raveyekê li ti to on?'ê, ango 'He çi ye'yê?' vêya rave dike: touto esti tis he ousia; ku em wergerînin: "maneya ti to on'ê ev e: "Heyîtî'ya[19] heyî'yan çi ye?" He'ya heyî'yê, di heyîtî'yê

15 *Orexis: Azwerî, daxwaza zêde ya gihaştina tiştekî yan hêvîyekê.*

16 *Xerabûna ahengê, jihevparçebûn.*

17 *Eros: Evîn, Arezû, Dilbijîn. Li gorî mîtolojîya Grekan xwedawenda evînê ye.*

18 *Hen; Yek. / Panta; Tev, giş, tevayîya tiştan. "Hen panta einai." Yek ji fragmanên Heraklîtos'î ye. Dibêje,"Her tişt di yek'ê da ye, Her tişt yek e."*

19 *Heyîtî: Ousia; Seiendheit; Beingness.*

da ye. Lê Platon vêya (ousia) wekî îdea û Arîstoteles jî wekî energeiayê dîyar dike.

Vêga, hîn ne lazim e ku em bi temamî rave bikin, bê ka Arîstoteles bi energeia'yê dixwaze çi bibêje û ousia ji hêla energeia'yê ve çawa tê dîyarkirin. Niha tenê ya girîng ew e,

em baldar bin, bê Arîstoteles kakilê fîlozofîyê çawa pênase dike. Di pirtûka yekem a "Metafîzîk"ê da (Met. A2,982 b 9) weha dibêje: "Fîlozofî, episteme ton proton arkhon kat

aiton theoretike ye."Mirov epîsteme'yê, wekî "zanistî"yê werdigerînin. Ev werger, me diweritîne; ji ber ku, em tev, pir bi hêsanî têgiha "zanistî"ya nûjen lê zêde dikin.

Wergerandina episteme'yê wekî "zanistî" şaş e, ku em zanistîyê bi awayê ku Fichte, Schelling û Hegel qest dikin, fam bikin jî. Peyva episteme'yê, ji rengdêra ku koka wê lêker e, epistemenos'ê tê: Mirovê ku li ser tiştekî rayedar û jîr e. Fîlozofî episteme tis e, awayek rayedarbûnê ye, a/ê ku dikare theorein'ê bike, ango theoretike ye, ya ku hewl dide tiştekî bibîne; rayedarbûn e li ser dîtina tiştê ku dixwaze bibîne û nahêle ji bînahîya çavan derkeve. Loma, fîlozofî episteme theoretike ye. Îjar, tişta ku fîlozofî wê li bînahîyê dihêle çi ye?

Arîstoteles dibêje, "Protai arkhai kai aitiai" û bersiva pirsa me dide. Xelk weha werdigerînin: "rêgez û sebeb", ango rêgez û sebebên pêşîyê yên heyî'yan. Rêgez û sebebên pêşîyê, bi vî awayî, he'ya heyî'yan çêdike. Piştî du mîlenyûm û nîvan, êdî wext e ku em lê biramin, bê çi pêwendîya he'ya heyî'yan bi tiştên wekî "rêgez" û "sebeb"ê ra he ye.

Bi çi maneyê li he'yê diramin heta ku tiştên wekî, "rêgez" û "sebeb"ê, xwe bidin ber barê he'ya-he'ya heyî'yan[20] û bandorê lê bikin?

Lê niha em bala xwe didin tiştekî din. Hevoka Arîstoteles'î, ji Platon'î û bi vir ve, ji me ra dibêje, berê tişta ku em jê ra dibêjin "fîlozofî", ber bi ku ve ye. Ev hevok di barê 'çi ye ev fîlozofî' da agahîyekê dide me. Fîlozofî, cureyekî rayedarîyê ye ku me li ser maneya heyî'yan, ango heyî çi ye, dike rayedar.

Pirsa ku divê liv û xemeka berhemdar têxe axaftina me û berê axaftina me bide rêyekê, ango pirsa "Fîolozofî çi ye," ji mêj ve Arîstoteles'î bersiva wê daye. Ku ev rast be, êdî ne lazim e em biaxivin. Berî ku axaftina me dest pê bike, xelas bû. Dibe ku yek bibêje, daraza Arîstoteles'î ya di barê çi-bûna fîlozofîyê da, bi tu awayî nabe ku bersiveka yekta be û li ber wê rabe. Ji nav gelek bersivan, ev bi tenê

*20 Das seiend-Sein des Seienden / The being-in-being of Beings.*

bersivek e. Bi alîkarîya pênaseya fîlozofîyê ya Arîstoteles'î, em hem dikarin ramana berî Arîstoteles û Platon'î, hem jî fîlozofîya piştî Arîstoteles'î bidin naskirin û şiroveve bikin. Her weha, em dikarin bi hêsanî rê bidin ku di du hezar salî da, hem fîlozofî bixwe hem jî şêwaza xwenasandina wê, piralî guherîye. Ma kî li ber vêya radibe? Lê belê, ji Arîstoteles'î heta Nietzsche'yî, em nikarin nebînin ku tam di bingeha van guherînan da û dema van guherînan, fîlozofî her car wekî xwe maye. Ji ber ku guherîn, ji bo wekî-xwe-mayînê temînat e.

Em, bi vê gotinê, qet angaşt nakin ku pênaseya fîlozofîyê ya Arîstoteles'î tekez rast û rewa ye. Ji ber ku, ev, di dîroka Grekan da, tenê şiroveyeka taybet a ramana Grekan e ku spartine vê ramanê. Pênaseya fîlozofîyê ya Arîstoteles'î, bi tu awayî li ramana Heraklîtos û Parmenîdes'î nayê wergerandin; berovajî vê, pênaseya fîlozofîyê ya Arîstoteles'î, bêguman, encameka azad a ramana berî xwe û bi-dawîbûna ramana berî xwe ye. Ez dibêjim, "encameka azad," ji ber ku bi tu awayî em nikarin biçespînin ku yek bi yek fîlozofî û serdemên fîlozofîyê, wekî pêvajoyeka dîyalektîk ji hev derketine (çêbûne).

Di vê axaftinê da, me hewl da em li pirsa "Çi ye ev – fîlozofî?" bikolin. Encama gotinên me çi ye? A pêşîn ev e: divê, em bi tenê pişta xwe nedin pênaseya Arîstoteles'î. Ji vê jî, ev encam derdikeve: bivênevê ye ku em hesabê pênaseyên berê û paşê yên fîlozofîyê bikin.

Û paşê? Paşê, bi rêya razberkirina danberhevî, em ê di hemî pênaseyan da xala hevbeş bibînin û derxin holê. Paşê? Em ê bigihêjin formuleka beredayî ya ku li her cure fîlozofîyê digunce.

Paşê? Bi qasî ku dibe, em ê ji bersiva pirsa xwe dûr bikevin. Em çima hatin di vir ra derketin?

Ji ber ku, bi rêya rêbaza ku vê bîskê me qala wê kir, em, tenê pênaseyên ku he ne, li gorî dora dîrokê kom dikin û wan di nava formuleka giştî da dibişêvin. Vana tev, birra jî dibe ku bi pisporîyeka mezin û formulên rast bên kirin. Ku em weha bikin, bi qesta şopgerandina xwezaya fîlozofîyê, hema piçkî be jî, ji me ra ne lazim e, em xwe bi fîlozofîyê bilebikînin. Bi vî awayî, di dîroka fîlozofîyê gişî da, em dikarin zanînên cur bi cur û kêrhatî di barê fîlozofîyê da bi dest bixin. Lê bi vê rêyê, em ê tu carî bersiveka birra, ango bersiveka rewa a pirsa "Çi ye ev – fîlozofî?" nedin. Bersiv, dibe ku tenê wekî gotina-dij (ant-wort, bersiv, gotina-hember) di-xwe-da bersiveka fîlozofî be. Baş e, em ji vê hevokê çi fam bikin? Bersiveka wekî gotinadij, çawa dibe ku fîlozofî be? Niha, ez ê bi çend îşaretan, tê da bixebitim ku vêya



zelal bikim.
Tişta ku li vir mijara gotinê ye, dê hey axaftina me, biqilqilîne. Heta dê bibe pîvana axaftina me, bê ka dikare bibe axaftineka fîlozofî yan na. Ev bi tu awayî ne di destê me da ye.

Bersiva pirsa "Çi ye ev – fîlozofî?" kengî dibe bersiveka fîlozofî? Em kengî bi fîlozofîyê diramin? Dîyar e, tenê wexta ku em bi fîlozofan ra diaxivin. Ev jî tê da ye: Hûr û kûr axaftina bi fîlozofan ra, li ser tiştên ku ew qala wan dikin. – Hûr û kûr – axaftina tişta ku fîlozofan têkildar dike, a ku yek e û her car heman tişt e, legeîn'a bi maneya dialegesthai'yê ye; Axaftina dialogî ye (axaftina-bi-hev-ra). Em niha vî derîyî vekirî dihêlin: gelo dîyalog bivênevê dîyalekjtîk e yan ne dîyalektîk e û kengî dibe dîyalektîk.

Çespandin û şayesandina nêrîna fîlozofan û axaftina hûr û kûr, bi wan ra tiştek e; axaftina bi wan ra li ser tiştên ku wan gotîye – ango tiştê ku li ser axivîne – bi tevayî tiştekî din e.

Hesêbkî, he'ya heyî'yan, bi qasî û ji bo bibêjin 'heyî çi ye' bi fîlozofan ra diaxive; naxwe axaftina me ya bi fîlozofan ra jî, divê mixetabê he'ya heyî'yan be. Divê em bixwe, tişta ku fîlozofî ber bi wê ve li ser rê ye, bi ramîna xwe pêşwazî bikin. Axaftina me, divê beramberî tişta ku bersivê dide fîlozofan be (entsprechen). Ku em bikarin axaftina xwe, rakin asta
lêvegerandina bersivê, wê çaxê, em ê bi rastî bikarin bersiva "Çi ye ev – fîlozofî?" bidin. Di Almanî da gotina 'dayîna bersivê' (antworten, dij-gotin,) bi maneya beramberbûnê (entsprechen)[(21)] ye. Bersiva pirsa me, bi bersiva pirsa 'ka mirov têgiha "fîlozofî"yê bi çi awayî disêwirînin' xelas nabe. Bersiv, ne angaşteka li hemberî wê ye ( n'est pas une réponse); bersiv bêtir, axaftina beramberî he'ya heyî'yan e (la correspondance). Lê, em di cî da, dixwazin bizanin bê ka taybetîya bersiva bi maneya axaftina beramber, çi ye. Berîya ku em teorîyekê di barê vêya da ava bikin, divê em bigihên beramber-bûn'ê.

Lihevkirina bi tişta ku fîlozofî ber bi wê ve bi rê da ye, bersiva "Çi ye ev – fîlozofî?" ye. Ew jî - he'ya heyî'yan e. Bi awayê axaftina beramber, em guhdarî dikin li tişta ku fîlozofîyê ji berê ve ji me ra gotîye, philosophy, ango philosophia'ya ku bi Grekî hatîye famkirin. Bi vê

sebebê, em digihêjin axaftina beramber, digihêjin maneya pirsa xwe – tenê bi
vî awayî, em pê ra daxivin, bi tiştên ku kevneşopîya fîlozofî digihîne me û pê me xelas dike.
Em bi agahîyên dîrokî yên di barê pênaseya fîlozofîyê da, bersiva pirsa xwe nabînin. Axaftina me û tişta ku xwe wekî he'ya heyî'yan gihandîye me, a em bi wê axaftinê, bersiva 'dibe ku fîlozofî çi be' dibînin.

Ev rêya ku ber bi bersiva pirsa me ve ye, ne birrîna pêwendîya ji dîrokê ye, ne reda dîrokê ye; lê, veguherandin û xwemalîkirina ya guhastî[22] ye. Bi gotina "destruksîyon[23]"ê qesta
min xwemalîkirina dîrokê ya bi vî awayî ye. Wateya vê gotinê di "He û Dem[24]"ê da bi zelalî hatîye dîyarkirin. Destruksîyon ne bi wateya xerakirinê ye, – bi tenê, xerakirin, dûrxistin û danîna kêlekekê ya raveyên dîrokî yên di barê dîroka fîlozofîyê da ye. Destruksîyon ev e: vekirina guhî ye, vekirîhiştina guhî ye ji bo tişta ku wekî he'ya heyî'yê ji rabirdûyê, bi me ra diaxive. Bi guhdarîkirina li vê axaftina ji bo me, em digihêjin axaftina beramber.

Hema ku me ev got, gumanek dîyar bû: Ji bo ku em bigihêjin axaftina beramber a he'ya heyî'yan, ma em mejbûr in têbikoşin? Em mirov, ne bi tenê de facto (di rastîyê da), lê ji
ber xwezaya xwe, ma jixwe em tim ne di halê axaftina beramber da ne? Ma ev beramberbûn ne taybetîya bingehîn a xwezaya me ye?

Birra jî weha ye. Madem weha ye, êdî ne hewce ye em bibêjin, divê em bigihêjin axaftina beramber. Lê, em bi mafdarî cardin jî dibêjin. Ji ber ku, em tim û li her derê bi awayekî ku bi he'ya heyî'yê ra beramber bin, cîyê xwe çêdikin; lê em pir kêm li axaftina ji bo me ya he'yê guhdarî dikin. Beramberbûna he'ya heyî'yan, bawer bikin, tim qonaxa me ye. Lê, ev bi tenê car caran dibe helwesta xwe-gihandinê ku me xwe daye ber barê wê. Tenê wexta diqewime, em ji dil, beramberî xema fîlozofîya ku ber bi he'ya heyî'yan ve bi rê da ye, diaxivin. Axaftina beramber a bi he'ya heyî'yan ra fîlozofî ye; lê ancax fîlozofî, eger axaftina beramber jixweber pêk

21 *Heidegger 'ent-sprechen' li vir bi maneya bersivê danîye. Di rûpelên pêş da bi maneya "lihevkirin" (axaftina bi sophon'ê ra li hev) gotibû. Min li her du cîyan "axaftina beramber" bi kar anî.*

22 *Ya ku kevnşopîyê guhastîye, gihandîye me.*

23 *Destruction: Hilweşandin, rûxandin, wêran kirin, kavil kirin, xopan kirin.*

24 *Berhema Heidegger'î "Sein und Zeit".*

25 *Saz dike: at-tune. Bi Alm. be-stimmt: bi maneya ferhengî "dîyarkirin." Lê, bi awayê Heidegger'î maneya kortkirinamuzîkê jî didêre.*

bê û bi taybetî xwe bigihêne û vê xwe-gihandinê berfireh bike, çêdibe. Ev axaftina beramber, li gorî axaftina he'yê, li gorî bihîstina vê axaftinê an jî xwelêkerrkirinê, li gorî gotina tişta ku hatîye bihîstin an jî neaxaftinê (bêdengbûnê) bi awayên cuda çêdibe. Axaftina me, ji bo ku em di vê mijarê da biramin, dibe ku fersendan ji me ra çêbike.

Anha tenê ji bo axaftinê, ez hewl didim pêşgotinekê bibêjim. Ez dixwazim tiştê ku heta niha hatine gotin, di ser gotina Andre Gide'î ra (hestên xweş), ber bi tiştê ku me qal kir ve piçekî (bi paş ve) vegerînim. Philosophia, axafineka beramber a taybet e ku he'ya heyî'yan (pê) bi baldarî bangî me dike û diaxive. Axaftina beramber, li sewta ya ku ji bo me diaxive, guhdarî dike. Ya ku wekî sewta he'yê bi xweşî bangî me dike, axaftina me ya beramber saz[(25)] dike. Naxwe axaftina beramber, dîyar-bûn e, être disposé, ango ji hêla he'ya heyî'yan ve. Li vir Dis-posé tîp bi tîp ev e: ji-hevveqetîyayî, li-rastê û bi vî awayî bi heyî'yan ra pêwendîdarkirî ye. Heyî, wekî axaftina sazbûyî, bi vî awayê gotinê, xwe bi he'ya heyî'yan ra, diguncîne. Axaftina beramber bivênevê û her gav lê tê guncandin, ne tenê bi rasthatinî û ne tenê carna diqewime. Ew di halê pêhesînê da ye. Û bi tenê li ser bingeha halê pêhesînê, gotina axaftina beramber, vekirîbûn, tekezî û dîyarbûna xwe, bi dest dixe.

Wekî tiştekî di halê pêhesînê da û bi awayekî sazbûyî, axaftina beramber ji gewherê xwe ve di halê pêhesîna-hindurîn da ye. Bi vî awayî, tevgerên me di bin nîrê pêhesînekê da ne. Halê pêhesîna-hindurîn a bi vî awayî hatîye famkirin, ne muzîkeka hestan e ku çawalêhato derketîye û tenê bi axaftina beramber ra rêhevaltîyê dike. Bi pênasekirina fîlozofîyê ya wekî axaftina beramber a di halê pêhesînê da, em bi tu awayî naxwazin fîlozofîyê ji guherîna hestan a çawalêhato û kêmbûn û zêdebûna wan ra, bihêlin. Berovajî vê, tişta ku mijara gotinê ye, bi tenê vêya îşaret dike: her vekirîbûna gotinê, li ser pêhesîna hindurîn a axaftina beramber û baldayîna ya gotî, bilind dibe.

Lê berî her tiştî, destnîşankirina axaftina beramber wekî halê pêhesînê yê gewherî, ne gotine-

*26 Pathos: Hest, Êş, Cerabe, ne parçeyê çi-yetîya tiştekî ye, ne parçeyê kakilî (ousia) ye, lê bi wî kakilî ve girêdayî ye.*

*27 Platon, Theaitetos 155 d. "Mala gar philosophou touto to pathos, to thaumazein. Ou gar alle arkhe philosophias e aute."*

*28 Arkhe: Destpêk, Cîyê destpêkê, Rêgez.*

*29 Arîstoteles, Metafîzîk. A2, 982 b. "Dia gar to thaumezein hoi anthropoi kat nun kai proton erxsanto philosophein."*

ka nû ye. Ramyarên Grekî, Platon û Arîstoteles, berê bal kişandibûn ku fîlozofî û xebitîna di fîlozofîyê da, rehendeka mirov in ku niha em wekî halê pêhesîna-hindurîn (bi maneya bûna-di-halê-pêhesînê da û dîyarbûna ji hêla wê ve) bi nav dikin.

Platon dibêje, "Elbet, he be tune be, ev pathos(27) (hest), ev heyrmayîn, a fîlozofan e; ji ber ku ji xeynî vê, destpêkeka serwer a fîlozofîyê tune ye."27

Heyrmayîn, wekî hest (pathos) arkeya (arkhe(28)) fîlozofîyê ye. Em, divê peyva Grekî arkhe'yê, bi hemî maneyên wê fam bikin. Ew derdibire ku tiştek "ji ku" dest pê dike. Lê ev "ji ku", wexta em ji wê dest pê dikin, li dû me namîne; berovajî vê arkhe, werdigere tişta ku lêkera arkhein (archein) wê tîne zimên, werdigere tişta serwer. Hesta (pathos) heyrmayînê weha bi awayekî hêsan li destpêka fîlozofîyê nasekine; li ser meselê, ne wekî şûştina destan a

berî emelîyatê ye. Heyrmayîn, fîlozofîyê hildigire û ji destpêkê heta dawîyê serwer e.

Heman tiştî Arîstoteles dibêje, "Lewra, mirov di nav heyramayînê ra çûn, hem niha hem jî cara ewil gihaştin destpêka serwer a fîlozofîyê"(29) (gihaştin qonaxa ku ramîna fîlozofî jê

dest pê dike û gihaştin tişta ku rêkudandina ramîna fîlozofîyê ji serî heta dawîyê dîyar dike.)

Em biramin ku Platon û Arîstoteles, li vir bi tenê heyrmayîn wekî sebeba ramîna fîlozofî çespandine, dê ramîna me pir di ser ra be û ramîneka ne-Grekî be. Eger ku, ew li ser vê ramanê bûna, dê tiştekî weha bûya: demekê mirov heyr man, ango li he'yê, hebûna he'yê û he çi be li wehabûna wê heyirîn. Mirovên ku bi vê heyrê tev rabûn, dest bi ramîna fîlozofî kirin. Piştî ku fîlozofîyê dest pê kir, wekî sebeb heyrmayîn, bû zêdehîyek û ji meydanê rabû.

Tenê ji ber ku handerek bû, tune bû. Lê, heyrmayîn, arkhe ye; ji destpêkê heta dawîyê serwerê

her gava fîlozofîyê ye. Heyrmayîn pathos e. Em pathosê bi giştî wekî hest (passion), azwerî û

tevrabûna hestan werdigerînin. Lê belê pathos, bi rêya paschein'ê, bi kişandina êşê ra, bi

xweragirtinê ra, semaxkirinê, hilgirtinê, xweberdanê, xwehesînê ra girêdayî ye. Di rewşên

weha da, wergerandina pathos'ê wekî halê pêhesîna-hindurîn, xetere ye. Em bi halê pêhesînahindurîn, bûna di halê pêhesînê da û dîyarbûna ji hêla wê ve, qest dikin. Lê cardin jî bivênevê

ye, em xwe li vê wergerê biqelibînin; ji ber ku, tenê ev dikare me ji sêwirandina psîkolojîk a

pathos'ê ya dema nûjen biparêze. Ku em pathos'ê wekî halê pêhesîna-

hindurîn fam bikin,
ancax wê çaxê em ê bikarin thaumezein'ê, heyrmayîn'ê baştir pênase bikin. Di kêlîya
heyrmayîn'ê da, em xwe, bi xwe digirin (être en arrét). Em li hember he'yê, hebûna wê, çawa
be wehabûna wê û nebûna wê bi awayekî-din, hema hema bi paş ve gav diavêjin. Heyrmayîn
bipaşvegavavêtina li hember he'ya heyî'yê ra, bi dawî nabe; berovajî vê, ew wekî
bipaşvegavavêtin û xwebixwegirtin, her weha ji hêla tişta ku li hember wê bi paş ve gav avêtîye, tê kişandin û hema hema dîl tê girtin. Bi vî awayî heyrmayîn, rewşa pêhesînahindurîn e, ewqasî ku he'ya heyî'yê di vî halê pêhesîna-hindurîn da û ji bo wê, xwe vedike.
Heyrmayîn, rewşa pêhesîna-hindurîn e ya ku ji fîlozofên Grekî ra axaftina ku bi he'ya heyî'yê ra li hev dike, debirandîye.

Halê pêhesîna-hindurîn a ku pirsa kevneşop 'heyî çi ye' bi şêwazeka nû dipirse û bi vî awayî di fîlozofîyê da demeka nû dide destpêkirin, bi tevayî tiştekî din e. Di medîtasyonên xwe da Descartes tenê û ewilî ti to on'ê, 'heyî çi ye'yê napirse. Descartes vê pirsê dike: di maneya ens certum(30)'ê da heyî'ya herî rast (birra) kîjan e? Li gel vê, ji bo Descartes'î gewherê certitudo(31)'yê veguherîye.

Loma, certitudo di serdema navîn da ne tekezî bû; berovajî vê, bi awayekî pir zexm bisînorkirina vêya bû: heyî çi be, ew e. Certitudo hîn jî li vir bi essentia'yê (kakil) ra hemmane ye. Li hemberî vê, tişta ku he ye û rast e, bi şêwazeka din tê pîvandin. Ji bo Decsartes'î guman, dibe halê pêhesîna-hindurîn a ku tê da sehekîbûn ber bi ens certum'ê ve, bi tekezî ber bi heyî'yê ve tê ajotin. Certitudo, vediguhere çespandina ens qua ens(32)'a ku encama bêgumanîya cogito (ergo) sum(33)'ê ye ji bo ez'a (ego) mirovan. Loma, ez dibe teşeyekî taybet ê sub-jectum'ê (li bin, li jêr, bingeh) û ji ber vê gewherê mirov, cara ewil, dikeve qada subjektîvîyê di maneya ez'ê da. Ji halê pêhesînê ber bi certitudo'yê ve, gotina Descartes'î tekezîya têgiha "wergirtina zelal û eşkere"yê (clare et distincte percipere) bi dest dixe. Gumankirin, ahengek û helwesteka erênî ye ber bi tekezîyê ve. Tekezî ji vir û şûn ve dest pê dike û werdigere teşeyê ku pîvana birra'yê ye. Bawerîpêanîna mirov ji tekezîya bêbirr a zanînê ya her car (mirov) dikare bigihêjê, wekî pathos dimîne û ji ber vê dibe rêgeza (arkhe) fîlozofîya serdema nû.

Wê çaxê, telos(34)'a fîlozofîya serdema nû, temambûn û bidawîbûna wê, eger ku em bikarin qala vê bikin, çi ye, li ku disekine? Ev dawî, ma ji hêla halekî din ê pêhesîna-hindurîn ve hatîye dîyarkirin? Divê em li ku

derê li bidawîbûna fîlozofîya serdema nû bigerin? Di fîlozofîya Hegel'î da yan di fîlozofîya Schelling'î ya demên wî yê dawîn da? Îcar ji bo Marx an jî Nietzsche'yî mesele çawa ye? An jî ew êdî ji rêya fîlozofîya serdema nû dagerîyane? Eger na, em ê çawa cîyê wan dîyar bikin?

Mirov dibê qey em bi tenê li ser lêkolînên dîrokî pirsan dikin. Lê ya rast, em li gewherê fîlozofîyê yê dahatûyê diramin. Em han didin ku sewta he'yê bibihîzin. Ev sewt, ramîna îro dixe kîjan halê pêhesîna-hindurîn? Em ancax dikarin bi zor û bela, bersiva pirsê peyda bikin. Herhal, halekî bingehîn ê pêhesîna-hindurîn serwer e. Lê ev niha, hîn jî xwe ji me vedidize. Ev îşareta vê yekê ye ku ramîna îro, hîn jî rêya xwe nedîtîye. Tiştên ku em pêrgî wan dibin tenê ev in: halên pêhesîna-hindurîn ên cihêreng ên ramînê. Guman û bêhêvîtî li hêlekê û bi korfamî bawerkirina ji rêgezên neceribandî li hêla din, li hember hev in. Xem û
tirs tevlî hesta hêvî û bawerîyê dibin. Pir û bi giştî weha xuya dibe, ramîna ku pişta xwe dide liaqildanê û hesabkirinê, ji her cure halên pêhesîna-hindurîn bi tevahî dûr in. Lê sarîya di hesabkirinê da û bêcoşbûna di plankirinê da jî, îşaretî halekî pêhesînê ye. Tew bi ser da – aqilê ku xwe ji her cure bandorên azwerîyan diparêze jî, pêjna wê bawerîyê dike ku rêgez û rêpîvanên wî, bi mantiqî-matematîkî tên famkirin.

Axaftina beramber, a ku guh dide bangkirina he'ya heyî'yan, a ku xwe dixe bin bar û ya ku xwe digihêne, fîlozofî ye. Ku em hîn bibin bê fîlozofî çawa ye û di kîjan şiklî da ye, em ê bikarin çi-bûna fîlozofîyê nas bikin û bizanin. Fîlozofî di şiklê axaftina beramber da ye ku bi sewta he'ya heyî'yan ra li hev e.

Ev axaftina beramber, axaftinek e. Ew, di xizmeta zimên da ye. Îro ji bo me dijwar e em têbigihêjin bê ev bi çi maneyê ye. Ji ber ku guherînên seyr di sêwirana me ya di barê têgiha zimên da, çêbûn. Ziman, wekî navgîna vegotinê xuya dibe. Li gorî vê, li şûna ku em bibêjin, wekî axaftina beramber, ramîn di xizmeta zimên da ye, em bibêjin ziman di xizmeta ramînê da ye çêtir e. Îro, sêwirana me ya derbarê zimên da, berî her tiştî, ji cerabeya Grekan a

*30 Ens certum (ens creatum): Heyîyên birra, Heyîyên çêbûyî, Heyîyên afirandî, Created thing, Certain being.*
*31 Certitudo (certitude, Certainty): Tekezî, bêgumanî, mîsogerî.*
*32 Ens qua ens: Bi awayê ku he ne "heyî".*
*33 Cogito (ergo) sum: Diramim, naxwe ez he me.*
*34 Telos: Temambûn, Dawî, Mebest, Armanc.*
*35 Hölderlin, Friedrich "Patmos."*
*36 To on legetai pollachos: Heyî, bi gelek awayan tên binavkirin.*

derbarê zimên da, heta mirov bibêje bes, dûr e. Gewherê zimên xwe wekî logos'ê nîşanî Grekan dide. Baş e, lê logos û legein çi ne? Bi tenê van rojan, bi alîkarîya şiroveyên cihêreng
ên logosê, em hêdî hêdî gewherê wê yê destpêkê yê Grekî dibînin. Lê, em tu carî nikarin vegerin vî gewherê zimên, ne jî em dikarin hema weha xwe bidin ber vî barî. Tevî vê jî, cardin em divê pê ra, bi zimanê ku bi Grekî wekî logos'ê hat tecrubekirin, biaxivin. Çima? Ji ber ku, heta em têr lê neramin bê ziman çi ye, em ê tu carî bi rastî nezanin fîlozofîya ku wekî axaftina beramber hatîye pênasekirin û şêwazeka taybet a axaftinê ye, çi ye.

Gava ku em bi ramînê ra wê didin ber hev, hunera helbestê, ji ber ku bi awayekî bi temamî cuda û taybet di xizmeta zimên da ye, axaftina me, ya ku li dû şopa fîlozofîyê dirame, bivênevê ye bigihêje nîqaşkirina pêwendîya ramîn û helbestê. Di navbera her duyan da, di navbera helbest û ramînê da, merivantîyeka xef he ye; ji ber ku, her du jî xwe di xizmeta zimên da didin bikaranîn û xwe didin mezaxtin. Her weha di navbera her duyan da newaleka bêbinî he ye; ji ber ku ew "Li çîyayên cuda rûdinin."(35)

Niha, dibe ku bi mafdarî ji me bê xwestin ku em axaftina xwe bi pirsa di barê fîlozofîyê da bi sînor bikin. Eger, wekî ku heta vir di axaftina me da hat şirovekirin, ku eşkere bibe fîlozofî ne axaftineka beramber e ku bangkirina he'ya heyî'yê tîne zimên, ancax dê wê çaxê ev bisînorkirin pêkan be û heta bivênevê be.

Bi awayekî din, axaftina me peywira şopandina bernameyeka dîyar hilnegirtîye ser xwe. Lê axaftina me, dixwaze hemî kesên ku tevlî wê bûne, ji bo tişta ku em jê ra dibêjin, he'ya heyî'yê tê da bangî me bike, wan ji kombûnê/balê ra amade bike. Wekî me nav lê danîbû, jixwe, em li ya ku Arîstoteles'î berê gotibû, diramin:
"Heyî, pirawa xuya dibin."(36)

*ÇAVKANÎ*
*What is That – Philosophy?, Heidegger Martin, Translated and annotated by Eva T.H. Brann, St. John's college, Annapolis, Maryland, 1991.*
*(https://tr.scribd.com/document/202222059/What-is-that-Philosophy-by-Martin-Heidegger)*
*Nedir Bu Felsefe, Heidegger, Martin, Werger: Irgat Ali, Afa Yayınları, Mayıs 1995.*
*Historical Dictionary of Heidegger's Philosophy, 2nd ed. / Frank Schalow, Alfred Denker, Published by Scarecrow Press, Inc. 2010.*
*Some Greek Philosophical Terms, Prof. Taylor, Phil 3610, Ancient Philosophy, Marquette University, Fall 2009.*